Zanîarîêt Pêtivî bu Yarîkirna "Texmînê Bike!"

Ev yarîe yarîa wêne çêkirnê ye. Ḧemî kes dişên vê yarîê bikin. Dû miruv yan sê miruv yan her jimareka hebit. Herwesa tu dişêî wekî tîma yarîa bikî. Li destpêkê da pêtivî ye tu van karta jêk cida bikî. Van karta bi meqesê qet ke. Piştî qetkirna her perrekê dê te neh karte hebin.



Destpêka Yarîê

Ew kesê kartê di destî da (ewê kartê hildigirit), pêtivî ye ew kesê dî yêt tîma wî nezanin çi li ser kartê ye. Demê tu seḧ dikî kartê babetekê (Kî? Kîve? Çi? Çawa? Buçî?) hilbijêre ku ew babeta tu dê wêne wê çêkî bu tîma xu. U çênabit tu biaxivî. Bes wênê çêke. Belê tîma te hewl didin bizanin ew wênê ya çi ye. (Babetê texmîn bike!) Belê hevberê te jî dê rengî tiştî çêkit ewê we hilbijartî. U dê wênê bu tîma xu wêne kit. U ew kesê yan tîmê bizanit ew wênê ye ya çi ye, ew dê pile wer girit.

◄ Karta ewilî naête bi kar înan, belê taybete bu nimune da tu bizanî babetêt di yarîê çi ne:

Kî? = bu wênêt miruva diête bi kar înan

Kîve? = bu wênêt ciha yan bajêra diête bi kar înan

Çi? = bu wênêt tişta diête bi kar înan

Çawa? = bu wênêt bizavkirnê yan bizavkirna diête bi kar înan

Buçî? = bu wênêt ḧemî karêt zeḧmet yan qurs diête bi kar înan

Karta dûê wekî evê çende ye: ►



(1) Ew kesê karte di destî da brîyarê dit, êk ji van babeta hilbijêrit. Bu nimune Çi? se'et, belê **çênabit tu hevberê xu agehdar kî yan bêjîê te çi hilbijartî ye**. Belê pêtivî ye tu bêjîe çi babete wekî "Çi?" yan "tişt" ku da bizanit babetê wî çi ye.

Piştî te babet hilbijartî, u te gute hevberê xu babete çi ye (Kî? Kîve? Çi? Çawa? yan Buçî?), dest bi çêkirna wênê bike. **U çênabit ebet biaxivit**, ew kesê karte di destî da u wênê çê dikit.

Li vî demî hevberê te bizavêt dikit da bizanit ka wênê çi ye ewê tu çê dikî. Dest bi axiftinê bike u mebesta wî ewe: bizanit ew tu çi çêdikî. U ew kesê wênê çê dikit pêtivî ye wênekî ku hevberê wî bizanit ew wênê ye çi ye.

Ev karê he herwesa diête kar înan bu yarîa tîma. Belê pêtivî ye ew kesê li êk tîmê da wênêt wek êk dirist bikin da yêt beramberî wana bizanin ew wênê ye çi ye.

Ev yarîe gelek xuş e u her kesêk dişêt vê yarîa bikit. Belê xuştir e dibit heker pitir ji çar kesa yarîa bikin.

(2) Herwesa tu dişêî me'naê wî tiştî bêjî, belê navî çênabit tu bêjî. U hevberêt te pêtivî ye bizanin u bêjin ka ew çi ye.

(3) Yan tu dişêî zarî vekî, belê çênabit tu biaxivî.

Ew kesê me'na yan qesa (bi nimune "se'et") hilbijêrit yan bizanit, ew kese dê pileyekê wergirit, yan tîma wî pilê wergirit. U ew dest bi yarîê dikit.

Yarîekî xuş burîne! ☺

"Jîn" rujnameke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara rujina bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.